Lêvenerînên di laboratuwarên de hatine kirin, dixwazim bi kurtî pêşkêşî we bikim. Ji taybetmendiyên fîzîkî; li ser *avpizaviya (avmêtinî)* hûrdamarî, di giraniya atmosferê de avpizavî, di ava kelandî de avpizavî hatine test kirin û encamên li jêrê rêzkirî ji me re hatine şandin.

Li hemberî qerisandinê xwarbûn, *xurumandin* û di giraniya atmosferê de rêjeyên berevaniyê bikêrhatî hatine dîtin. Mebesta min ji ragihandina van agahdariyan ev e: Zîrekbûna bav û bavpîrên me yên ku ji derfetên teknolojiyê bêpar, bêyî taybetmendiyên keviran nas bikin, bi hezarên salan bi zelalî li ber çavan radixe.

Kevirên ku bi çavikên hûr bi hev ve ne girêdayine, bayê di çavikan de bernadin, zivistanan germ û havînan jî hênik in. Ev taybetmendîya keviran îro jî alîkariya çavkaniyên enerjîya ku roj bi roj kêm dibe, dike. Her weha; havînan ji ber germaya tavê, rûyê keviran yê derve hêdî hêdî disincire, ev germayî di zivistanan de li hundur vedide. Zivistanan avahiyên kevirî ji ber vê yekê germtir in, ango li hev vegereke xwezayî li kar e.

Ji ber piraniya kevir ji kilsa pak e, ji bo tendurustî-laşsaxiyê dijbakteriyel e û bikêrhatî ye. Ji ber ev demeke dirêj e ku em li Mêrdînê di avahiyên kevirî de dijîn, me divê em wêneyên dema meriv dikeve avahiyekê bi we re parve bikin.

Avahiyên kevn yên Mêrdînê bi piranî gava merîv tê ber derîyê hewşê yên derve, li ser deriyê derve du lib *mîkutkên* ji hesin hene. Ji ber dengê lêdana herdu mîkutkan ne wek hev in, yek ji bona endamên malê û yê, ya din jî ji bona mêvana ye, ji lêdanê dihêt zanîn ku yê li dergehî dide mêvan e an ji malê ye. Li gora dengê lêdana dergehî dema ku lêdan ya mêvanan be, hingî yên li malê li gora wê tevdigerin. Dergehên derve bi tevayî ji dara gwîzê yan jî ji ya tûyê ye. Li şûna menteşeyên îro, li jêra dergeh hêlîneke hesînî û li jorê jî dîsa ji dargwîz yan dartûyê ku dibû *zîlana dergeh* dihate çêkirin. Navê wan *şindeq* û *bindeq* bû. Gava ku meriv dikete hewşê, hêwaneke li gor hebûna malxwê bi nexşên wek dantêlan ji kevir neqişkirî an jî *kemberên li saya* derdikeve hemberî merivan. Ew kevirê di nîvê kemberê de, li hêla jorîn bicîhkirî, kevirê kilîtê ye. Li deverê herî pir kemberên ecemî derdikevin pêşiya me, ku ber bi jor ve *tûjikî* hatiye hûnandin. Kemberên çapê, di van cûrê kemberan de, li gor hêwan û firehbûna pencereyan temam dibe. Lê cardin jî em li hin berhemên ji dema Selçûqiyan mane rast tên ku hinekî nizimtir in û ji wan re dibêjin kemberên Bursayê. Dema ku meriv ji hêwanê derbasî hundur dibe du an sê derî derdikevin pêşiya merivan ku bi kemberên girover in û neqişandî ne û carinan pozikên giroveriyên wek portaqalan neqişkirî em lê rast tên, ew giroverî nîşana ku ew avahî çend ode (mezel, jûr) ne dide nîşandanê.

Dema ku meriv dikeve hundurê avahiyê, yekser serbanekî bilind bi ber çavê merivan dikeve. Ev ya *musalebe* yan jî *aqd* e. Musalebe ji bo odeyên zirav û dirêj in, aqd jî ji bo odeyên çargoşe ne.

Careke din jî divê hin hûrbîniyên di dîwarên odeyan de, werîn şîrove kirin:

Kulîn:
Bi piranî di orta wê *hêlîna* nivînan de li jorê kevirekî neqişkirî wek dardakirî, wek kevirê kilîtê heye. Du mînakên biçûktir li rast û çepê kulînê xuya dikin, yek ji bo balîf, *balgeh-zemberîşan* e û ya din ji bo serrax ango lihêfa ne. Her weha li ba wan malikên nivînan de *şamdanî* ku mêrdînî ji wê re dibêjin *meşme'e* (cihê mûmê), wek kulpikan di dîwarên odeyê de nigarkirî ne. Li hundurê odeyê di ser pencereyan hin kevîrên wek refikan wek 20 cm ji dîwêr zêdekirî hene ku ji bo hilanîna hinarên zivistanî ne.

Hinargeh:
Dîwar bi tevayî kevirî ne û zikê serban jî sewaxkirî ye. Ev *seyek (sewax)* ji nikarê ye ku ji ardê kevir û kilsa neşewitî hatiye tevlihev kirin. Wekî din çi tişt tev li vê seyekê dikirin baş nayê zanîn.
Ji bo pirsa germkirinê çareser bibe, di orta odeya rûniştinê de, dîsa di kevir de korteke bihostekê kwîr û ne gelekî fireh heye. Piştî komir an êzing ji perengî de ketin bûn agirê arîgirtî, dihanîn û dixistin wê kortalê, kursîyeke darîn datanîn ser, bi lihêfeke fireh û mezîn dinuxumandin. Endamên malê ji çarhawîr de lingên xwe dixistin bin lihêfa kursiyê û xwe germ dikirin. Di gelek malan de argûn jî hebûn. Ev argûn wek tifikên malan lê di dîwaran de *hêlînkirî* bûn. Maşe û distan ji argûnan kêm nedibûn. Tifik an kuçên êgir bêtir li hewşan bicîhkirî bûn.

Li xaniyên Mêrdînê hin kevir û tiştên kevirnîgariyê ku meriv tim lê rast dihat, yên navên wan dihatin gotin û ku em dizanin, ev in: Nîgarên ango neqşên li keviran bi pirranî mêwe (zeytûn, goşiyê tirî, dargerînk, pelên kerengan, pelên mêwên tirî), kevok, xezal û motîfên endazyarîyê (sêkevî, çarkevî, çargoşe û hwd) li Mêrdînê peyda dibin.

Berî ku diwar bê jenandin bi kevîpîvankê bilindahî û dirêjayiya kevir, ji bo wekhev bin, dihên pîvan.

Şeh: Ji bo pîvan û terişandina kevir, ji hesin çêkirî ye. 10 cm fireh 20 cm dirêj e, orta wî kunkirî ye ku bi doxeke ji dara berûyê doxkirî ye.
Rek: Ji bo dagirtina valayiyên navbera qorê keviran e ku ji kevirên biçûk, xilik û nikarê ye.
Kulîn: Hêlîna nivînan.
Hel û şed: Hosteyiya di dîwarjeniyê de ji bo xetên keviran neyên serhev.
Qozîbirr: (kujîbirr, qorzîbirr) Ev kevirên qesp û dirêj û fireh ku hîmên xênî li ser ava dibûn.
Qor: Rêza keviran ya seranserî.
Serder: Serderî.

Çeprast hûnandina serderan. Kevirên serdera pencereyan:
Kembera kol: kembera girover e.
Kembera ecem: Kembera tûjikî ye.
Derz: Wekhevkirin û mêzîna qorên keviran.
Derazîn: derîzan, derazîn, derçik, bersivk, asîtan, dergeh.
Mezrip, şurik: Ava barana û ya ji hilandina berfê ku ji serban bê vala kirin, ji keviran rêya avê ye ku zîncîrek pê ve dadilqandin da ku dema av ji serban were xwarê belav nebe û derûdora xwe tev şil neke.
Muqernes: Bêtir li avahiyên wekî mizgeft û medreseyan, di navbera mînber û deriyê derve de, neqş û nîgarên tevlihev yên şêwaza kembera bişûnveyî ye. <muqernes: ji yûnanî *kronîs*, ango çemyayî >
Curn: Ji bo destnimêjê, ji bo guvaştina zeytûnan û tirî, ji bo dan û savar kutanê bi kar dihêt
Pixêrî, bixêrî: Di ser tifikan re û li ser argûnan, ew kuna di dîwêr de hûnayî, bakêşa dû, dûmanê.
Kewar: Embarên biçûk yên ji herriyê, ji dexl û dan û hûrmûrên neliberdestan bi kar dihêt.
Borange(h): Taqa kevokan, bi tevayî li pêş avahiyê di ser pencereyan re ji bo hewirîna kevokan e.
Curnê avê: Ji bo kevok û çivîkan curnên ji kevir di hewşa avahiyan de, li hewşê, li tenhayek ku zûbizû rê pê nakevi de dihêt bi cîh kirin.
Qub, qube: çargoşe, şeşgoşe û heştgoşe ne. Avahiyên girover û sergirtî, bi tevayî li ser mizgeft, turbe, serê minaran tên çêkirin.
Cax: Di hundurê odeyê de li herdu aliyên derî yên hêla hundurû textebendên ji nîv metroyê bilindtir ku balgeh dispartinê.
Sincê kevirî: Sênc û perçînên ji kevir yên li dora nerdiwan û balkonan.

Hûrbîniyên keviran yên ji derve:
Kevirên derdora dergeh û pencereyan bi piranî neqişandî ne. Gelek fîgûr û wêneyên cûrbicûr ku piraniya wan nuha nayên zanîn û xwendin. Ew li dorberên pencere û deriyên nîgarkirî îro jî hene. Keresteyên ku di nîgarkirinê de dihatin bi kar anîn, navên hinan ji wan li jêrê rêzkirî ne:
Şablon: Mestereyên nîgarkirinê
Niqor: Minqar, miqar.
Minqar: Miqar, niqor.
Taqtoqa: Çekûç, mîrkut.
Nikar: ardê kevir.

kurdî	tirkî	fransizî	îngilîzî
hinargeh	kışlık narların muhafaza edildiği yer	niche murale pour la conservation des grenades en hiver	place where pomegranates are stored in winter
şehê keviran	yontma çekici	taillant	chipping hammer (for stone masonry)
rek	taş aralarını blokaj yaparak kireç ve taş tozu ile doldurma, kireç harcı	mortier de chaux	lime mortar
hel û şed	taşların sıra diziminde çizgilerin üst üste gelmeme pozisyonu	appareil, (maçonnerie)	brickwork or stonework
qozîbir	uzunca köşe taşı	pierre d'angle	cornerstone
qor	sıra dizimi	rangée	row
kembera kol	Bursa kemeri	arc de Brousse	Bursa arch, Bursa vault
kembera ecem	acem kemeri	arc persan	persian arch
kembera çap	yarıçap kemeri	voûte en berceau	semi-circuler vault
paceya çepûrast	çapraz örülmüş pencere üst kirişi	linteau droit clavé	gauged lintel
derz	derz	jointure, joint	joint, seam
merzîp, şurik	çörten	gouttière	gutters
muqernes	mukarnas	nid d'abeille	honeycomb work
curn	kurna	cuve	basin of a bath or fountain
curnê avê	su kurnası	cuvette à eau	water basin
qub, qube	kubbe, kümbet	coupole	dome, cupola
cax	tahta divan	divan en bois, estrade	low sitting divan
sincê kevirî	taş korkuluk	balustrades en pierre	stone balustrade
şablon	mestereyên nîgarkirinê: nakış şablonu	modèle d'ornement	template of ornamentation
minqar, miqar, niqor	keski, murç	ciseau plat	chisel
taqtoqa	tokmak, madırga	maillet	mallet
nikar	taş unu	poussière de taille	fine dust, rock flour


Taqtoqa, minqar, miqar, niqor



Minqar, miqar, niqor



Taqtoqa, minqar, miqar, niqor



Şehê keviran



Şehê keviran



Taqtoqa, çekûç



Qozîbir



Paceya çepûrast


Kembera kol


Kembera çap


Kembera ecem


Muqernes


Qub, qube


Çend dîmen ji avahiyên Mêrdînê
Quelques modèles architecturaux à Mardin
A few architectorial patterns in Mardin















Termsaziya pizişkî bi kurdî
- III -

Amadekar: Lezgînê ÇALÎ

kurdî	tirkî	fransizî	îngilîzî
jiberbirin	çocuk aldırma	avortement	abortion, induced abortion
jiberxwekirin	çocuğunu aldırma	avortement par soi-même	self-induced abortion
jiberçûn: beravêtin	düşük, düşük yapma	fausse couche	miscarriage
sîs	akşın, albin	albinos	albino
sîsî	albinizm	albinisme	albinism
kêm, edav, edab, nêm	irin	pus	pus
kêmxwîn, xwînkêm	kansız, anemik	anémique	anaemic
kêmxwînî, xwînkêmî	kansızlık, anemi	anémie	anaemia
kerr, nebihîsa	sağır	sourd	deaf
kerrî, nebihîsahî	sağırlık	surdité	deafness
kîsê zerdavê, ziravdank	safra kesesi	vésicule biliaire	gall bladder
kor, nebîna	kör	aveugle	blind
korî, korahî, koranî, nebînahî	körlük	cécité	blindness
bînahî	görme gücü	vue	vision, sight
kula guvirandinê (herisê)	ülser, mide ülseri	ulcère d'estomac	peptic ulcer
lîr, lûr	kurdeşen, ürtiker	urticaire	urticaria
spîxwînî, losemî	lösemi, kan kanseri	leucémie	leukemia
bariste	kütle	masse	mass
masûlkhestîkî	kas-iskelet	musculosquélettique	musculoskletal
neasayî	anormal	anormal	abnormal
bawîtî	romatizma	rhumatisme	rheumatism
belekî	vitiligo	vitiligo	vitiligo
berdêr	verimli, doğurgan, üretken	fertile	fertile
berdêrî	verimlilik, doğurganlık, üretkenlik	fertilité	fertility
berjeng	semptom, belirti	symptôme	symptom
bêxwînî	iskemi, lokalize anemi	ischémie	ischemia
buhujek	çözelti, solüsyon	solution	solution
bişav	süspansiyon	suspension (chimie)	suspension (chemical)
ceribandin	deneme	expérience	experiment
dermanxane	eczane	pharmacie	pharmacy
dermannasî	farmakoloji, eczacılık bilimi	pharmacologie	pharmacology
dermannas	farmakolog, eczacı	pharmacologue	pharmacologist
dildank	perikard, kâlp zarı	péricarde	pericardium
dilkulî	kalp iltihabı, kardit	cardite	carditis
masûlkedil	miyokard, kâlp kası	myocarde	myocardium
masûlkedilkulî	miyokardit, kâlp kası iltihabı	myocardite	myocarditis, myocardial infection
dilnasî	kardioloji	cardiologie	cardiology
dilnas	kardiolog	cardiologue	cardiologist
domdar	kronik	chronique	chronic
dot	kız evlat, kız	fille	daughter
dûnde	evlat, döl	enfant	offspring, child
azmûn	1. deney, deneme; 2. test, sınav	1. expérience ; 2. test	1. experiment; 2. examination, test
azmûnî	deneysel	expérimental	experimental
fîloyî	filaryal (hastalığa özgü)	éléphantiasique	elephantic
fîloyîbûn	fil hastalığı	éléphantiasis	elephantiasis
aşikkulî, mîdekulî	mide iltihabı, gastrit	gastrite	gastritis
gurrîtî	uyuz hastalığı	gale	scabies
guhkulî	kulak iltihabı	otite	otitis
gurçikkulî	böbrek iltihabı	néphrite	nephritis
herisandin (heriskirin), givêrandin, ferikandin	1. sindirmek; 2. sindirme	1. digérer ; digestion	1. to digest; 2. digestion
herisîn, givêrîn, ferikîn	sindirilmek	être digéré	to be digested
givêrker	sindirimi kolaylaştıran, hazmettirici	digestif	digestive
hewdan, hewahildan, ragirtin	enfeksiyon	infection	infection
hewdayî, hewahildayî, ragirtî	enfekte olmuş	infecté	infected
jin	kadın	femme	woman
keç	kız	fille	girl
keçel	kılkıran hastalığına yakalanmış, kel	teigneux	affected with tinea capitis
keçelî	kılkıran, kellik	teigne	tinea capitis
kêm, nêm	irin, cerahat	pus	pus
kefse	dizanteri	dyssentéry	dysentery
kotî	cüzamlı, cüzama özgü	lépreux	leperous, leprotic
kotîtî, kotîbûn	cüzzam	lèpre	leper, leprosies
kur	oğlan	garçon	boy
lenfgirêk	lenf bezi, lenf yumrusu	ganglion lymphatique	lymph node, Lymphatic gland
lenfkulî, avkênc, kênc, arinc	lenf yumrusu yangısı, lenfadenitis	lymphadénite, inflammation des glandes	lymphadenitis glandula inflamation
marik	kurt, askarit	ascaride	round worm, ascaris
mêr	erkek	homme	man
mîrxiçik, mîrkute, mîkutok	suçiçeği	varicelle	chicken pox
mîzdankulî	mesane iltihabı, sistit	cystite	cystitis
mûkurm	kılkurdu	enterobius vermicularis, oxyure	pinworm

Eşîra Goyî
û taybetmendiyên devoka wan a kurmancî

Amadekar: Omîdê Mistefayê CELALÎ

Pêşek
Riknekî kurdnasiyê jî zaravanasî, devoknasî û nifşnasiya gelê kurd e. Her wiha ji bo ku pêvajoya geşedana zimanê kurdî derkeve holê û kurdiya destpêkî (proto-kurdish) aşkera bibe jî pêwistî bi vî riknî heye.

Em ê di vê gotarê de -li gorî hinek çavkaniyên berdest- konfederasyona eşîrên Goyî û taybetmendiyên devoka wan a kurmancî binirxînin û çend agehiyan bi we re pareve bikin.

Kovara Hawarê di rûpela yekem a hejmara xwe ya yekem de kurmancên goyî wiha dide naskirin: *"Herwekî xelkê Geliyê Goyan berî çardeh salan, gava tiyare dîtin, tavil bi zarê xwe balafir nav lê kirin. Ji lewre ko ji banî, ji bala difire."* Ji vê hevokê diyar e ku afirîneriya xeyala goyiyan bala Mîr Celadet Bedirxan jî kişandiye û lewre pesna vê afirîneriyê daye. Herwiha bi riya vê hevokê lêkolînên li ser vê devokê jî raspartine nifşên li pey xwe.

1. NASNAME Û WAR
Hinek çavkanî navê "goyî" dispêrin kurdên gutî (Ihsan Colemêrgî) û hînek jî dispêrin peyva "koyî/çiyayî" (BedelBoselî); lê belê ev agehî bi awayekî zanistî nehatine piştrastkirin. Ev nav ji ku hatibe û ji kîjan peyvê hatibe darijtin jî rastiyek heye ku şûnwarê konfederasyona eşîrên Goyî dikeve navbera deverên Botan û Behdînan. Navenda Goyiyan, Qilabana bi ser Şirnexê ve ye; lê di nava Colemêrg, Sêrt û Wanê de belav bûne. Pareke eşîrê jî li Hewlêr, Zaxo û Sersingê dijî. Ji ber kavilkirin û şewitandina gundên Kurdan bi destê Romê gelek endamên eşîra Goyî derbasî başûrê Kurdistanê bûne û li Wargeha Mexmûrê dijîn. Gelheya eşîrê der û dora sed hezar neferî ye û misilmanên şafiî ne..

Di dîroka Kurdistanê de Geliyê Goyan devera yekane ye ku derveyî pergala axatiyê jiyaye û serbixwe heta roja îro hatiye. Bi gotineke din pergala axatiyê tu carî li vê derê bi ser neketiye û axa ji vê deverê derneketine.

Goyî ji du hozan pêk tên û li 33 gundan belav bûne: Derşûvî û Ripinî. Her gundek ji çend tîre û bavikan pêk tê. Ripinî digel baskên xwe hemû li devera Revengan dijiyan û pêşiyên wan Evdalan in. Piştî ku şer û nexweşî dikeve navbera wan her du bavikên Ripinî ji nava eşîrê vedikişin û derbasî devera Ripinê ya îroyîn dibin, li vê derê ji xwe re gundan ava dikin.

Warên Ripiniyan: Qilaban, Ripin, Dalokon, Şirîş, Kalgê, Ziravik, Kadîn, Hilal, Şêxan, Sêgirik, Nêrweh e. Beşeke wan jî li bajarokên Kiror û Dêrhînê (Dêra Hînê) dijîn.

Warên Derşûviyan: Helet, Kalhesinan, Çeman, Mehrav, Nîreh, Billeh, Şiwêd, Robosk, Bêcih, Mêrgeh e. Beşeke wan jî li bajarokên Kiror û Dêrhînê (Dêra Hînê) dijîn.

Endamên eşîrê heta roja îroyîn jî mêr şal, şapik û tergalê kurdî; jin kiras-kurtik û fistanên kurdî li xwe dikin. Meqamên lîstîkên goyiyan ev in:
a. Emer Axa,
b. Fatmagê (taybetî goyiyan tenê ye),
c. De Gidî (ev lîstik zêdetir li gundê Dêra Hînê tê lîstin)
d. Bavlekan,
e. Dugavî,
f. Milonê (govenda giran),
g. Sêgavî,
h. Çep û Rast,
i. Şêxanî,
j. Hey Sêmêlê (govenda wê bi tevger û rîtmeke bilez tê gerandin).

Xwarinên wan ên sereke ev in:
a. Hilisa (helîse): Ji goşt, doşav û danê kutayî tê çêkirin.
b. Kutilka birincê
c. Kutilka savar
d. Xevis: Ji doşav, ard û rûne malê tê çêkirin.
e. Giro: Ji toraq, birinc û doşavê tê çêkirin.
f. Kerengmast: Ji kerengên kelandî û mastê avjêkişandî tê çêkirin.
g. Hêlizmast: Ji heliz û mastê çikandî tê çêkirin. Hêliz: Çêreyek e ku li zozanan û çiyayên bilind peyda dibe. Ji meha nîsanê heta destpêka meha gulanê hêşîn e û wekî alifê pêz û dewêr jî tê bikaranîn. Çêja wê gelekî tehl û dijwar e.
h. Jajî bûg û mandî/mendî.

Tevnkarî jî di nava goyiyan de bi pêş ketiye: Parzûn, xurc û xalîçeyên wan gelekî navdar in.

2. ÇEND RÛPEL JI DÎROKA GOYIYAN:
Şerefxan (1543-1603) di Şerefnameyê (1597) de dibêje ku devera Finikê aydî çar eşîrên kurd e û navê eşîra Goyî dikşîne. Li gorî Şerefxanî devera Finikê ji destpêka belavbûna îslamê heta dagirkirina Aqqoyuniyan di destê binemala Mîr Evdal de bûye. Piştî ku herêm bi qasî sed salî di bin zilma Tirkmenên aqqoyunî de zêrezêr dike, gelê herêmê biyaniyan ji axa xwe diavêjin û desthilatdariya wan heta nivîsandina Şerefnameyê jî domandiye. Ev rewşa xweser a eşîrê di bin banê Dewleta Osmanî de jî berdewam dike. Sir Mark Sykes -ê ku Peymana Sykes-Picot (16.05.1916) bi navê wî tê nas kirin- sala 1908an li çend deverên Kurdistanê digere; di gotareke xwe ya derheqa eşîrên heyama osmanî de qala goyiyan jî dike û hejmara wan bi qasî 1400 malbatî destnîşan dike. Herwiha dibêje ku eşîra Goyan canfidayê azadiya xwe ne. Di sedsala 20an de dema ku hêzên Îngilîzan dest bi dagirkirina Îraq û beşeke Kurdistanê dikin eşîra Goyî li hemberî dagirkeran berxwedaneke xurt dide. Mirov dikare bibêje ku berxwedana Kurdan a li Zaxoyê bi eşîra Goyî dest pê dike û di roja 04.04.1919an de generalê îngilîz Alfred Pearson di navbera gundê Bêcih û Mêrgeyê de bi destê goyiyekî bi navê Mistoyê Şaho (ji gundê Bêcihê) tê kuştin.

Goyiyan di salên 60î de piştgiriyeke xurt dane Mele Mistefayê Barzanî û agirê Şoreşa 11ê Îlonê geş kirine.

Ew 34 gundiyên Roboskiyê yên ku roja 28.12.2012an ji hêla balafirên cengî yên Dewleta Romê ve hatin qetilkirin jî ji eşîra Goyî ne.

3. TAYBETMENDIYÊN DEVOKA GOYIYAN

3. a. Dengnasî
Di devoka goyiyan de hinek deng ji hin devokên din ên kurmancî cihêtir in.

3. a. 1. Dengê [a]yê vediguhere [o]yê. Herwiha ew peyvên ku di piraniya devokan de bi dengê [a]yê dest pê dikin di devoka goyî de bi tu carî wekî dengê [a]yê nayên bi lêv kirin. Bi gelemperî [a] vedigure [o]yê; lê carinan jî bi temamî winda dibe.

bav	bov
av	ov
averê bûn (ji riya sereke derketin)	varê bûn

3. a. 2. Dengê [e]yê yê dawiya peyvan her tim vediguhere [a]yê û [e]yên din jî carinan.

me	ma
ez	a (az)

3. a. 3. Dengê [b]yê carinan vediguhere [v] û [f]yê û dengê [v]yê jî vediguhere [b]yê.

bi	vi
dehbe (ji "dâbbe"ya erebî)	dahfa

3. a. 4. Dengê [r]yê carinan bi temamî winda dibe û carinan kirpandin ji ser radibe.

ser	sa
dev jê berde!	dev jê baada!

3. a. 5. Dengê [k]ya dawiya peyvan carinan vediguhere [g]yê û carinan jî [g] vediguhere [k]yê.

hostak/hostayek	hostog
rik/rikoyî	rig/rigawî
bêgavî	bêkovî

3. a. 6. Dengê [ê]yê carinan vediguhere [ö]ya almanî û tirkî û carinan jî wekî xwe dimîne.

ê (ango erê)	ö
nesitêle	nastöla
bêcih	böjeh

3. a. 7. Ji bilî çend awarteyan qertafa [di-]yê ya lêkerên dema bê bi gelemperî vediguhere [t]yê.

diaxive.	t'oxiva.
dima.	t'mo.

3. a. 8. Carinan dengê [o]yê vediguhere [ö]ya almanî û tirkî û carinan jî wekî xwe dimîne..

ode	öde
gûzên Bêcihê ji gûzên gundên din xweştir in.	gözîn Böjeh ji gözîn gundîn dî xwaştir in!

3. a. 9. Carinan daçeka [ji]yê vediguhere [ş]yê.

ji xwe re	ş'xwa ra
Yekî ji wan got.	Êk ş'won gweht.

3. a. 10. Carinan hinek deng tên sivik kirin û vediguherin [y]yê.

tedbîr	teybîr
li hev hatin	leyhotin
li hev ketin	leyketin
leva kirin (pareve kirin)	leyvekiyin

3. a. 11. Wekî gelek devokên kurmancî di devoka goyî de jî dengê [ü]yê heye.

bûk	bük
şû	şü
tû	tü
xwîn	xün

3. a. 12. Dengê [h]yê yê ku di gelek devokên kurmancî de winda bûne di kurmanciya goyiyan de maye. Mirov dikare bibêje ku dengê [h]yê xîmekî bingehîn ê peyvsaziya devoka goyî ye.

gotin	gwehtin
birîn, birandin	birihîn, birihandin
çav	çehv

3. b. Peyvsazî

3. b. 1. Bi hinek paşgirên kêmnas dariştina peyvên resen

destar	gêrisa (ji gerandin û gêrkirinê)
wêrane	harifta (ji herifînê)

3. b. 2. Bi riya lêkera [kirin]ê cureyekî lêkerên cotlêkerî hatiye afirandin û wateya [karîn, şiyan]ê lê hatiye bar kirin.

ez nikarim.	az nekir kim.
nikarim bêm.	nehat kim.
nerakir kim.	nikarim rakim.
tu dê bikaribî biçî Cizîrê?	tê kir kî biçî Cizîrê?
ev bar giran e, nayê karîn ku bê hilgirtin.	av bor giron e, ne hilgirt kit.
dikarim rakim/nikarim rakim.	rokir kim/narokir kim.

Rovî kirin şivanê mirîşkan, rovî rûnişt û girîya…	Rwîvî kirin şivonê mîrîşkon, rwîvî rwînişt î girî...
Gotin rovî: - Tu ji bo çi digirî?	**Gwehtin rwîvî:** - Ti ji ba çi digirî?
Got: - Ez şaşika xwe wek Goyîyan girê nadim...!	**Gweht:** - A şoşko xwa wey Göyiyon girênedokim..!

3. b. 3. Bi riya hinek dengên parastî mirov dikare reh û rêçikên hinek peyvan texmîn bike.

şêmîk	şipîng (şûna piyan a li berê deriyan)

3. b. 4. Bi riya guherindina hinek dengan dariştina peyvên kêmnas.

şilijîn/şilijandin (şil û pil bûn/kirin)	şirizîn/şirizondin

3. b. 5. Bi riya qutkirina dawiya hinek lêkerên bi pêşgira [ve]yê pêkhatî, hinek navdêrên kêmnas hatine dariştin.

veder/vegir (nexweşiya bi riya temas û nefesê digihêje kesekî dîtir)	vadir (ji vedan)
herka avê (riya herikîna avê)	verêj (ji verêjtinê)

3. b. 6. Bi riya paşgirên kurdî ji peyvên biyanî lêkerên kêmnas hatine dariştin.

belaya xwe kirin stûyê yekî, miselet bûyîn	baliştin

3. b. 7. Di peyva yekjimar a mê û nêr de tewang nemaye; lêbelê di peyva pirjimar de heye. Herwiha di ravekan de jî ravekerên mê bi [e]yê tên tewandin.

Azêd got	Ozod gweht.
Zelalê got	Zelal gweht.
Gundiyan digotin	Gundiyon digwehtin.
sivikê malê	sivikî mol**e**

3. c. Cureyên Peyvan

3. c. 1. Veqetandek

Di devoka goyî de veqetandeka peyvên mê [o] ye.

mala me	molo ma
cewaba te	cewobo ta

Veqetandeka peyvên nêr [î] ye.

rezê xwe	rezî xwa
xalê me	xolî ma

Veqetandeka peyvên pirjimar [în] e.

mezinên me	mazinîn ma
dengbêjên wan	dengbêjîn won

3. c. 2. Cînavk

Cînavkên kesane yên yekjimar

ez	(a) az
tu	ti
ew	ew

Cînavkên kesane yên pirjimar

em	am
hûn	hûn
ew	ewon

Cînavkên şanîdanê yên nêzik

ev (yekjimar)	ev
ev (pirjimar)	evon

Cînavkên şanîdanê yên dûr

ew (yekjimar)	ew
ew (pirjimar)	ewon

Çend numûneyên alîkar ji bo têgihiştina hevoksaziya devoka goyî

Di her odeyekê de nêzikî pêncî mirovî rûniştin.	Ha ödeg da nêzîkî pênceh mirahv rûnîştîn.
Tiştek heye tiştanî	Tiştik heye tiştonî
Bi xwe hewa dikeve ser banî	F'xwe hewo t'kevit sa bonî
Ne pî pê ve ye ne panî.	Ne pî pê ve ye ne pehnî.
Rihberdan hêsan e, lê kurkirin zehmet e.	Rihbadon heson iha, lê kurki rin zehmet a.
Bixwaze ji deriyan, bike sedeqeya seriyan.	Bixoza j'daryon, bike sedeqo saryon.
Evdalan, mala xwe xera kir bi xeyalan.	Evdolon, molo xwa xirov kir v'xe yalon.
Kesê ne li malê, nizane dinya li çi halî ye.	Kesî na l'mole, nizonit dinyo l'çi hol a.
Roj diçe, lê bela naçe.	Roj diçit, bes belo noçit.
Cih ji xerîban (biyaniyan) ava nabe.	Ceh j'xeyîvon oxir novit.
Heçî (kesê) li ser destan neçe, qedrê piyan nizane.	Heçî l'sa deston neçit, qedrî pîyon nizonit.
Jina pevguherandî (berdêlkirî) her dienire.	Jino peygûharî ha eniriya.

DOŞAVA MASTÎ

Got, sibehekê jinikeke qilabanî dê biçûya bêriyê. Hêj neçûyî kurê wê dibêjê ji min re mast bîne. Jinik diçe mastî diîne, kurik dibêje doşavê berde nav, jinik diçe doşavê diîne û berdide nava mastî. Kurik nasekine, dibêje mêst û doşavê ji hev veqetîne. Diya kurikî ji qehran dikevê wî mastî dirijîne ser serê kurê xwe, kurê xwe dihêle, wisa diçe bêriyê. Heta êvarê kurikê biçûk wisa dimîne, çiqas mêş û kêşên dinyayê hebin tên ser serê wî.

DIFSÎ MOST

Gö, sihorîgi jingîg Qulovî dê çövo bêrî. Hêj neçöyî kurî wi d'bêjitê ş'mi ra most bêna. Jinig d'çi most t'ênit, kurig d'bêjit difs bikâ nêv, jinig diçit difs t'ênit û diki nêv most. Kurik nohedirit d'bêjit: most û difs jey bikâ, difsi ş'nêv most dâbêxa. Dîyo kurik ş'qehron tkevit ew most û difs qepî f'serî kurî xwe da dikit, kurî xwa dhilit, weson diçit bêrî. Heto êvorî kurgî kiçik dmêni wason, çen mêş î kêşîn dinyoyi tin sa serî wi.

4 - Spasî

Di amadekirina vê gotarê de gelek hevalên goyî alîkariya min kirin. Di serî de spasiya kekê Umer Encu û Osman Unver dikim. Spasiyên taybet ji bo berhevkar Seyda Goyan ku gelek zehmetî bi vê nivîsê re kişandin, edîtoriya vê nivîsarê kir, pirtûkên xwe yên li ser devoka goyî ji min re şandin û beşeke berhema xwe ya ber çapê bi min re pareve kir. Bi rastî berhema wî ya bi navê "Dastanên Kurdî -bi devoka goyî-" şahesereke qada xwe ye û hemû berhemên wî ji aliyê Enstîtuya Kelepora Kurdî (Silêmanî) ve hatine weşandin.

1 Hawar, sal 1, hejmar 1, 15 Gulan 1932, Çapxaneya Tereqî, Şam.
2 http://www.yuksekovahaber.com/yazi/bu-bir-fermandir-2556.htm
3 http://www.bedel-boseli.com/2012/08/goyi-esiretinin-isim-anlam-ve-tarihi.html
4 http://tr.wikipedia.org/wiki/Goyan_Aşireti
5 http://wejeyagoyiyan.blogcu.com/goyan-goyi-asireti/10672828
6 http://ku.wikipedia.org/wiki/Şerefxanê_Bedlîsî
7 Şerefname, Şerefxanê Bedlîsî, Avesta, Stenbol, 2007, r. 245.
8 The Kurdish Tribes of the Ottoman Empire, Mark Sykes, The Journal of Royal Anthropological Institute of Great Britain and Ireland, Vol. 38, (1908) p. 451- 458.
9 The Kurdish National Movement: Its Origins and Development, Wadie Jwaideh, Syracus University Press, New York, 2006, p. 148.
10 Roboskî-Goyîler, Ismaîl Beşîkçî, http://www.ilkehaber.com/yazi/robosk-goyler-9466.htm
11 https://www.facebook.com/omurkan73
12 https://www.facebook.com/oso.goyi
13 https://www.facebook.com/misexti

Herwiha bnr.

http://www.bbc.co.uk/remembrance/wall/record/12557

http://books.google.com.tr/books?id=FCbspX-dGPYC&pg=PA148&lpg=PA148&dq=goyan+tribe&source=bl&ots=RmH2iXWk8H&sig=Sv_I99e1tyMdcAv5RB3vtX6FOoU&hl=en&sa=X&ei=o9mlU73eIMeK0AXMp4DQBQ&ved=0CD0Q6AEwBQ#v=onepage&q=goyan%20tribe&f=false

http://intersci.ss.uci.edu/wiki/eBooks/Articles/1908%20Kurdish%20Tribes%20Sykes.pdf

http://www.kaldaya.net/2012/Articles/02/45_Feb20_AbdulmaseehBoya.html

KURMANCÎ

MAGAZINE LINGUISTIQUE KURDE, supplément du Bulletin de liaison et d'information

Directeur de la publication : **Reşo ZÎLAN,** *Réalisation :* **M. HASSAN**